

Encamên jeopolotîk û êkolojîkî yên çikkirina gola Urmiye

»»» R:10



Yekbûn

»»» R:2

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (427) 06-08-2022 Buha (1000) Tûmen

Navê Xaweranê, xîmê dîktatoriyê dihejîne

»»» R:3

25'ê Gelawêjê û hevgir- tina mayînde!

»»» R:7

Civîna hevpar ya rêberatiya herdu aliyên Partiya Demokrat hat lidarixistin

Di civîna hevpar ya herdu aliyên rêberatiya Partiya Demokrat de, dawîn qonaxên pirsê yekgirtina Demokratîtan hat gengeşekirin.

Êvareya roja Sêşemî 11'ê Gelawêjê, endamên rêberatiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Partiya Demokrat a Kurdistanê bo dana-behev û gengeşekirina dawîn qonaxên pirsê yekgirtina Demokratîtan civiyan.

Li beşa yekem ya civînê de, berpirsên heyetên danûstandinên herdu aliyên Demokratîtan dawîn raporên xwe yên li derheq pirsê gotûbêjan bona serkevîna malbata mezin ya Partiya Demokrat pêşkêşî vê civînê kirin. Di vê raporê de tevî îşarekirina hûr bi vê pêşveçûna girîng û deştkevtên xuya yên li rewta piroseyê yekgirtinê de ku çê bûne, hûrgeliyên qonaxên piroseyê jî bona zelalbûna zêdetir a endamên rêberatiya herdu aliyên Demokratîtan li ser axavtin.

Herwisa di beşa duyem ya civînê de, Mîstefa Hicrî



Lêpirsyarê Gîştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Xalid Ezîzî, Sekreterê Gîştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê tevî spaskirin ji kar û xebata demdirêj ya heyetên danûstandkaran û herwisa micidbûna rêberatiya herdu aliyên Partiya Demokrat di bi encam gihandina piroseyê dijwar lê, hêvîdan bi yekgirtina Demokratîtan, dîrdîmenên kar û têkoşîna Partiya Demokrat a Kurdistana Îrana Yekgirtî, erk û berpirsahiyên qonaxên paşerojê yên xebat û têkoşîna Partiya Demokratê deşt nîşan kirin.

Mîstefa Hicrî, di axavtinê xwe de bal kêşand li ser vê mijarê ku bi îrade û erkveg-

irtina hemûyan yê, rêzên Partiya Demokrat li ser hev dixin û qonaxê nû ya hêvîbexîş di bihêzkirina xebat û têkoşîna Partiya xwe de li Rojhilatê Kurdistanê li pêyxema bideştveanîna mafên neteweyê xwe yê deşt biserde hatinê girtin yê li Îranê de berdewam dikin.

Mîstefa Hicrî tevî îşarekirin bi zirar û xesarên li hev veqetiyana rêzên Partiyê û herwisa ev xesarên ku ji yekgirtina xebat û têkoşîna Partiya Demokrat kevtine, li ser vê yekê tekezî kir ku divê li ser hev xistina rêzên Partiya Demokrat û rêkixistina hêza xebatkar ya me, hem qerebûya vê qonaxê lihev qutbûnê

bikin û hem jî gur û teneke bihêztir bibin bi tevgera mafaxwazî ya gelê xwe.

Xalid Ezîzî, Sekreterê Gîştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê jî, di axavtinê xwe de bal kişan li ser vê mijarê ku, yaku heta niha heyetên danûstandkar bi alîkariya hizra herdu aliyên bi mebesta bi encam gihandina piroseyê yekgirtina Demokratîtan heta dawîn qonaxên vê encam dane, erkvegirtin û heştîkirina bi berpirsahiyê dîrokî û xebatgêrî bûye, lê yaku di paşeroja xebata hevpar ya me de di yek rêzê de û bona gihîştin bi armanca tevgera me li ser milê hemûyan giraniyê dike, divê heta li ser pê pêbend bi berpir-

sayetiyê bin.

Herwisa Xalid Ezîzî di berdewamiya axavtinê xwe de, li ser vê mijarê axavt û got, raşte em herdu aliyên Partiya Demokrat bi sedema jihev qutbûna di vê heyamê de bi awayekê cuda xebat û têkoşîna me hebûye, lê em bi vê yekê serbilind ku me micidane li dijî Komara Îslamî xebat kiriye. Xwedî derkevîna me li pirsê Kurd li Îranê de, me dîrokek rewneqdar a hevpar encam daye û niha jî bona bihêzkirina pêgeha Kurd û pêngava bandordar bona serkevîna xebata neteweyê xwe, em rêzên xwe rêk dixînin. Herwisa di vê civînê de, micidbûn û îradeya rêberatiyê ya herdu aliyên Partiya Demokrat di bersivdana hewce ya dîrokê de û gihandina piroseyê yekgirtina Demokratîtan dawîn qonaxên xwe bilind ragirtin.

Civîna hevpar ya rêberatiya herdu aliyên Demokratîtan piştî behs û gengeşeyan li ser dawîn qonaxên piroseyê yekgirtinê û hêvî dan bi ragihandina dawîya piroseyê di paşerojek nêz de, dawî bi karên xwe anîn.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Gelek tiştên cuda dibe bibin sedem ku hejmarek mirov li dewra yektir kom bike bo vê ku bihevre kar bikin û dem, saman û jiyana xwe bo terxan bikin, bi vê wateyê ku dibe peywendiya xizmatiya wan dewreke girîn hebe an, dibe nasnameyeke herêmî an mezintir li herêmekê, beşek li welat an heta nasnameya giştîgirtir a tev civakê vê hinceta bihevre bûnê dabîn bike. Dibe berjewendiyên cuda yên mirovan di xalek û kulegek taybetî de yek bigirin û ev hejmar ji wan kesan bihevre hewl bidin bona gihîştin bo vê tiştê ku qezenca tev ji wan tê de he ye, dibe bawerî û hizra hevpara bihevrebûnê girê bide û dest di nav destê yektir de danên da ku ev bawerîya hevpar li ser bixînin.

Her yek ji wan henicetên cuda bo dewra yektir bûnê, dibe li dîmeneke giştî de wekhev bîn berçav, û tev ji wan weke sedema girêdanên mirovan bi pênaseyeke mezintir ji tak bide nasîn ku jê ra dibêjin girûp an sazî, lê bi xaricemî ve her yek ji wan sedeman, diyardeyeke cuda û encamek cuda li pey xwe hedibe.

Ya ku girîng e, Partiya Demokrat di nav wan hinceta de an bi zimanek din bêjin teşvîq û motîv(bizvîn) çend aliyên cuda û handerên cuda bûye sedema pêk hatin û berdewamiya têkoşîna vegeşiyayî û sedemên vê

Yekbûn



pêkve girêdana takan ku jê ra dibêjin endam, zêde jî kirine û her bi vê sedemê ye ku weke diyardeyeke siyasî bûye hebûneke zindî ku ev heyama çendîn dehan e berdewame û bi awayek berdewam jî vedigeşe.

Sedemên kombûnên mirovan an saziyeke weke Partiya Demokrat ku çend rojên din 77 sal li ser jidayîkbûna vê de derbas bibe, cuda ne û dibe sedemên cuda jî, li hinek demên tengav de bibin sedema perçe bûnê, lê ya girîng ev ye ku partiyek zindî û vegeşînkirî weke Partiya Demokrat ji wan ezimûnên tal, mifahê werbigire û sedem û hincetên cuda yên mirovên xebatkar bike destkevt bona bihêzkirina partiyê û pir rengbûna saziya ku hezkirin û xwînsêrîniyê, cem xelkê bi wan rengên cuda zêd bike û partiyek rengîn pir ji bedevî nîşana xelkê bide, da ku hejmarek zêdetir li dewra wê kom bibin.

Careke din Partiya Demokrat yekgirtin di nav refên vê de pêk tê gorê, ev yekgirtina dibe bibe bihevre bûnek ku bi tev endamên vê çi niha û çi di paşerojê de bêje ku sedemên bihevrebûna me evqas zêde ne ku, ti hincetek nikare lojîka jihev qutbûna me hincetê bo bîne. Em di nav partiyekê de bi şîkl û reng û hezên cuda de dikarin dewrek wisa druşt bikin ku sedemên cuda nek gefên ji hevqutbûna me nekin belkû bibin hêza zêdetir û handerên zêdetir bona rakêşana xelkek din jî bo aliyê rêzên bihevre girêdana me.

Yekbûna me ne bi wateya jinavbirina rengan û kipkirina dengan e, belkû bo bihêztirkirina xebata me û qahîmkirina girêyên hizra hevpar û xelayên yek alî yên me ye. Careke din dîrok ji me re dibêje ku ti yek jihev veqetiyaneke û însê'abek di nav Partiya Demokrat de serkevtî nabe û Partiya Demokrat yeke û Kurdistan jî yek Demokratê dixwaze.

Navê Xaweranê, xîmê dîktatoriyê dihejîne



N: Nûredîn Sofizade

Di Havîna sala 1988an de “1367an Rojî” piştî qebûl kirina biryarnameya 598 an ya UN ji aliyê rejîma Îranê û dana berhev a wê ji aliyê Xumeynî ve, weke vexwarina cama Jehrê, û rawestana şerê bê encamp yê 8 sale ya di navbera Îranê û Îraqê de, deshilatdarên rejîmê û serweyî hemiyan Xumeynî, bi armanca tepeserî û matkirina heçî dengê nerizayetiye û çavtirsandina xelkê daku pirsyara li ser encama şer nekin, fermana kuştar û êdama bi kom ya hepsiyan siyas dan.

Di heyamê nêzik bi 3 mehên Havîna wê salê de, Hezaran kes ji girtiyan siyasî êdam kirin û heta cenazê wan jî radeştî malbatên wan nekirin û hemî li gorên bikom de bin ax kirin.

Gelek ji wan girtiyan siyasî ku di nava wê pêla berfireha êdaman de, hatine kuştin, hela nehatibûne mehkeme kirin û hikmê wan nehatibû diyarî kirin, gelek ji wan hikmê serbestî berdana wan hatibû danê, gelek ji wan piştî êdamê hikmê azadiya wan û bê tawaniya wan hate danê.

Bi ferman û hikmê nivîskiye Xumeynî bo encamdana wê cinayeta hovane, girûpa merg pêk hat û kevtne nava girtîgehan û gorî hinek amaranê nefermî pitir ji 8 Hezar girtiyan siyasî êdam kirin, herçiqas alîgir û endamên piraniya part û aliyên siyasî û netewî ber wê komkujiyê kevtin, û dehan endamên hizbên Rojhilatê Kurdistanê û ji wan PDKÎ jî nav de bûn, lê piraniya wan êdamkiriyan endamên Mucahidînê Xelkê Îranê bûn.



Piştî hingê ev cinayeta hovane ku bi bê dengî hatibû kirin û tu kes ji xelkê Îranê û malbatên girtiyan tu zaniyariyek li wê derheqê de çinebûn, bi hevpeywanekî Ayetulla Muntezirî ev cinayeta û kuştara bikoma hepsiyan hate eşkere kirin, lewma jî Muntezirî heta roja mirinê ji aliyê rejîmê ve hate ceza danê û di mala xwe de hate hepis kirin, û belavbûna heçî cure deng û rengê wî hate qedexe kirin û hemî pile û deshelatek jê hate şandin.

Belê wê demê eşkere bû ku piraniya wan girtiyan ku li girtîgehên Tehranê de hatinê êdamkirin, li cihekê bi navê Xaweran pê Lodêran xendeq kolane û cenazê wan êdamkiriyan tê de binax kirine.

Piştî hingê xelkê Îranê û malbatên qurbanîyên wê cinayetê, hemî salê di demsala Havînê de bi deşte Gulan

serdana Xaweranê dikirin û ezîzên xwe bi bîr tînan, rejîm bi armanca wê kombûna malbatên qurbanîyên 67ê îsal devra Xaweranê hemî Betonkêşî kiriye da ku berahîka merasimên bîranînê bigre û nehêle malbatên wan herin Gulên xwe danên li ser wê Zewiyê, lewma xelk û malbatên wan hemî dewra diwarê Xaweran bi danana Gulan xemilandine.

Deshilatdarên herî pile bilind yên rejîmê wekî serkomar û yên din, ji wê girûpa kuştara bikom ya girtiyan bûn û heya îrojî bi şanazîve berevaniyê ji wê cinayeta xwe dikin, dema ku rojnamevanekê li wê derheqê de ji Îbrahîm Reîsî yê serkomarê rejîmê pirsî ku dibêjin te di kuştara 67ê de deşt hebûye, Reîsî di bersivê de got: Xelkê Îranê û mirovatî divê sipasê û pêzanînê ji min bike ku min ev kare kiriye.

Xelkê Îranê û malbatên qurbanîyan, hertim bi bîrînen xwe ve dinalînin û êşa wê dikêşin û benda rojekê ku ev cinayetkarên rejîmê di dadigeha gel de bikevne ber deşte dadperweriyê û bigihjin cezayê cinayetên xwe.

Rejîm ku niha li ser lêva kendalê sernixuniyê ye, ji heçî demê zêdetir ditirse û mînak em dikarin amajê bi hikmê dadigeha Swêdê bi dijî Hemîd Nûrî yek ji cinayetkarên ku deşt di kuştara girtiyan 67ê de hebû, çiqas rejîma Îranê û deshilatdarên wê xistîne tirsê û merg û cezayê wan jî anî ber çavê wan.

Xelkê Îranê û malbatên êdamkiriyan 67ê bê guman tu caran wê cinayetê ji bîr nakin, kêşana diwarê Betonî û jinav birina Xaweranê jî, nikare yad û bîranîna wan qurbanîyan û cinayeta rejîmê a bi dijî mirovahiyê li bîr û hizra wan de reş bike.



Cîrok: Meta Meştûre



N: Bêhzad Qadrî

W: Hesên Mukere


Min jê ra got, em serdana meta Meştûre bikin. Min ev nas nedikir digot, ev gelek bi temen nine, lê ketiye, temenê wê nêzî 60 salan e lê, wisa xuya ye ku 90 sal jî derbas kiriye.

Min di hizra xwe de wisa diresimand ku, jinek Kurd be û 60 sal jî temenê wê be lê 90 salî xuya be, wate enfal û yên bi zindî çal kiriyên serdemên Sedam raşterast ditiye û di dema kîmiyabaranê de li şeqamên bajarê Helebçeyê de pêngav havêtiye û bêhna Sêv û Pirteqalê miştiye, û li pey bidarvekirinên Tehranê de xwe vekutana yên bidarvekirî li mejiyê wê de hatine tomarkirin helbet. Renge ti yek jî wan jî heta di xewin û xeyalan de jî nedîtibe, lê xeyal weke hespê ku hevsarê wê qut bibe dide çilîdê.

Min jê ra got, çima dibe ku em serdana pîrikê bikin? Meta Meştûre yek jî wan kesane ku ez gelek hez dikim ku em serdana wê bikin. Ez hez dikim çav li nav çavê wê bikim û guhdarî dengê wê bibim. Ji bo ku, gotinên tiştên baş pê ne!

Min nedizanî ku tu ewqas hez ji bihîştina serpêhatî û efsaneyê dikî.

Ev ne efsaneyê ku behs dike û ne jî serpêhatî ne. Digel karesatan jiyan kiriye û ji bo te wan behs dike. Dîrokê ji bo te behs dike. Yaku li ti pirtûkekê de nehatibe nivîsîn. Û li devê ti kesî der neketibe! Lêbelê, min nedizanî ku te kêf ji dîrokê jî tê!



Meta Meştûre ez hîn kirimç ku ez hez jê bikim. Metê bavê mine, lê ji bavê min zêdetir kêf ji min tê. Çima?

Ji ber ku ez baş dizanim dijiwariyên çawan dîtî e. Gelek baş dizanim ku dîtingehên wê çiqas birîndar in. Baş jê fêm dikim.

Aha! Xwe temenek wisa jî tune ye, tiştên çawan dizane bo behs kirinê?

Dema ku em cem wê rûniştin û bo me axavt, tuyê bixwe vê demê dê bizanî ku bi wî awayî behskirina vê xweş nine.

Wê hertim hez diki ku min heyrî mayî bike. Ti carî behsa meta meştûre bo min nekiribû. Her jixwe ra bi bejin û bala wê ve nedîçû. Heşt hundrî min weke kurmên nav mejiyê min de dubare diqin-qilîn. Pirtûkxwaneke wiha, çi tiştêk di wê pîrikê de peyda kriye ku wihsa hez dikir wê bibîne?! Meta Meştûre çi şibandinek digel pîrika di anv romana “Daştayufêsikî” hebû ku li “Raskîlînikof” bi bivêrekê li serê vê xîstî û ev kûşt! Erê bo mîna “Raskîlînikof” digel min poêngavan dihavêje û rengê şeqam û avhiyên mirî yên vê serdemê yên Rûsyayê pê ve xuya ye?!

Min li derî xîst. Kurek ku serê wî girover û tijî bû û herwisa temenê wî jî 6 heta 7 salî bû derî ji me vekir. Bera xwe da wê û got. Metê li odeya xwe de ye û ti kes cem

wê tune ye. Hundrî hewşê bûn. Hewşeyek mezin û odeyek piçûk li koncik de, em pêngavan ber wî alî ve dihavêjin, zarok jî bi revîn xwe li hundrî avahiya bermaberê wê kir û li pişt pencereyê temaşe dikir!

Em hundrî odeyek din bûn, odeyek 3 bi 5, meta Meştûre ji aliyê serê raketibû. Haydarê silav lêdana me nebû. Min jêra got rakevtiye, bîstekê çavnhêr bikî dê hişyar be.

Got, temaşeyî vê odeya tarî bike ku xewê çawan ew digel xwe biriye! Gelo bêjî niha xewina çi tiştêkê dibîne! Dibêjin xewina êvaran girane. Xartice im ku xewnek giran ev dorpeç kiriye ku dengê me nebihiştiye. Xewinek bi bê bêhna îro, bi bê rengê miriyên niha! Xewnek wisa nizane ku Hinar çi tişteke û bi mêr didin, û nizane mîxek çi tişteke û çareserî di danûstandinê de ye. Xewinek ku niha bê ziman û haydarê xwe nebûn.

Min jê ra got em herin, bila wê haydar nekin gunêhe. Yê pîr gelek bi zehmetî xew ji çavên wan dikeve.

Na tu temaşe bike! Şêwaza razana wê jî taybet e. Her di xewê de jî hibêmiza wê vekiriye û çavnhêr e. Himbezek ku çavnhêrî wan xurtan dike ku berhema “Orgasimê” nin. Dil nadim wê bicih bihêlim, ez jî her mîna wê me weştîyayî û weştîyayî. Mandîtir ji vê pîrika ku ev heyama

salane ku pê yên xwe bicih hêlane û nekariye pêngavan havêje. Pîrekek tev çiyayên li ser piştê vê mirine. Dileke pîr coş hebûye ku destê miskirî hebûye û çareyek dîktator. Temaşe bike çavnhêrî mirinê ye. Her roj dengê mirinê dibihîse, mirinek ku nikare dilê wê bide sekandin, nikare rê ji herikîna xwînê di nav demarên wê de bigire.

Ez hundirî nav kûrahiya peyvên wê bibûm! Bibûm bi mêhvanê odeyekê ku pîrejinek li hundre de rakevtibû. Odeyek bê serober çavên xwe girtibûn. Lê, temaşeyî wênayan dikir. Lênihêrînek lawaz û aloz, rakevtiye û li koncekê dûr de xwe komkiriye li ser hev, min xewnên wê didîtin. Xewneke reşbelek torek sor bi dengê zimêyna dihol û hiştirekê ku cihê simên wê li ser berfê bi cih dimînin...

Min îhsas dikir ku ez hatime sekr kirin! Lê, min nedizanî sehra pîrejîneke rakevtî an ya odeyêke mirî an peyvên yaxî yên hevalê min!

Min jê ra got ka de em herin, ev wênayan bo min gelek giran in, peyvên te jî giran in. Na were em herin pêşê.

Destê min girt. Li nêzîk temaşeyî min dikir. Mîna vê bû ku tey bigotiba ku heta niha min ti pîrejînek nedîtibe! Ev pîr coda bû! Li ser kêlega çepê rakevtibû û

»»»Doma R:4

tezbîhek li destê wê de bû û devê vê verkirî bû. Li kêlegê rûniştin.

Min jê re got, temaşe bike, ez dizanim ku meta Meştûre kê ye. Pîrekek pir pir li pîrik û mîrên tev tûken û nêçîrvan û horebêj e. Tijiye li kabûs û xarafat û nivîs û girêyên hişk yên doxînê. Ecêbgirtî mabû ji bêhna senêr û laşê pîs. Çareserkiriye li êş û azarên sêxksa netewav. Meta Meştûre jineke qermiçiye, qemûçekan gihîştine erdê, xeyalên wê tev bûne nav koma dalanên tijî piyase û tezbîhên weke şelax asayan. Îzraîl li mirina wê de ji bo wê behs dike da ku mirin jê hilweşe. Meta Meştûre jineke qermiçiye, min dîtîye ku çawan nebiyana bi xîşêna elageyên destê kurê xwe dibir. Hertim tema devê wê tal bû, weke serboriyên wê, weke rojgarên wê, weke niha û paşerojê. Xwazî niha çavên xwe vedikirin û em digel xwe dibirin, em dibirin bo wan rojgaran ku erd û esman tevlihev bibûn.

Deng ji me derdikevt, lê meta Meştûre haydar nedibû. Xewinên wê kûrtir ji vê bûn ku wê hizr jê dikir.

Got, temaşeyî wan korîşkên li ser rûyê wê bike, li ser hev siwar bûne! Her yek ji wan çîrokek û ramanek tê de çal kirine.

Min got, yek û yek ji wan behs bike.

Temaşeyî min kir, rengê min guherî weke “Raskîlînkof”, Raskîlînofa” piştî tewanê.

Tifa xwe qut kir û got, germahiya şer bû, meta Meştûre li gund de jiyana xwe derbas dikir. Keçike bedev û 17 salî bû. Tev êvaran çavnhêr bû: “Vê êvarê neyên, dê sibeyê êvarê bi xatircemî ve bîn”. Çavnhêrî hatina pêşmergeyan dikir. Ku li mewdayek dûr ve ew dîtîtin, digot: “Ey goriyê hêz û qaweta we bim, ey goriyê pêngavên we bim.” “Ebdula” jî pêşmerge bû. Lê, ... lê, ji aliyek din ve “Roştem” dev jê ber nedida. Meştûre evîndarê pêşmergeyatiyê bû, çimkî Ebdula jî pêşmerge bû. Roştem jî xwefiroşekî serberedayî bû û hez ji Meştûrê dikir. Û hemî rojî digel komêk xwefiroş û pasdaran xwe li hûndrî gundê wan dikir.

Berî avabûna rojê, ji tirsê hebûna pêşmergeyan wînda dibûn, û xwe di heft konan de werdiştartin. Wî demî çax qiran bû. Roj nedibû ku dehanû

sedan xwefiroş û pasdar neyên kuştin.

Demekê bêdeng bû û berdewam kir: Roştem ji wan gevadên rojgarê bû, û çend caran raştî êrîşên pêşmergeyan hatibû, lê, revîbû. Destê wî jî bi xwîna pêşmergeyan sor bibû, destûra kuştina wî hatibû dan. Ebdula Meştûre digel xwe nedibir, jê ra gotibû bo me nan bipêje, ez vê yekê ji te dixwazim. Tendûr jî ji Meştûrê bibû bi dojah, tenê ji ber xatirê Roştem.

Roştem çend caran êrîşî Meştûrê kirbû, lê Meştûre weke pêşmergeyekê bertek nîşan dabû, îca ezê çawan herim mala çax û xwefiroşekî?!

Îca çawa ezê herim mala bê şerefekî nîştiman firoş?! Wî pêşmerge şehîd kirine. Divê wî biskitînin, divê wî hincî hincî bikin, divê agir berdîn laş û mal û halê wî, kîjan gēj diçe mala çaxekî bermarxwar? Êdî bêzar bibû. Ji Ebdula re gotibû, ku êdî ev nan napêje, û dê çekê havêje milê xwe. Ebdula jî jê ra gotibû, Roştem bikuje piştî were. Mînek dabû bi Meştûrê, û li bajarê Bexdayê çavnhêrî wê kirbû. Hemen rojê Roştem peyda bû, û Meştûre jî bi dizîve mîn xîstbû nav tiromibîla Roştem û filitî bû. Digel Ebdula li ser çiya ser dikevtin û li gund tengê te-

qînê dihat. Roştem demldest siktîbû, û çend pasdar jî dest û lingên wan perî bûn...

Çîrokek dirêj heye... Êdî Meştûre bibû bi pêşmerge. Lê, gelek zû Ebdul hat şehîd kirin. Û Meştûre jî bi tenê nedikarî pêşmergeyatiyê bike. Û wegeriya bû male û li tirsê canê xwe digel çaxêke din zewcî bû...

Di nav serpêhatiyê de xen-qîbûm, min axavtinên wî jê dan qut kirin û jê re got, were em herin, xewna wê gelek ji vê yekê girantire ku di demek nêz de haydar bibe. Em li cihê xwe rabûn û derkev-tin derve. Di nav kolanê de min got em çi demekê serdan meta Meştûre bikin?

Xwaşt bersiva min bide ku, kurê tefeş xir bibez hat şona me, got: “Keko keko... metê metê”...

Ev yek got û bibez wegeriya. Dema ku em zivirîn û hundr bûn, dengê lorîna mîr û jin û zarokan li odeya meta Meştûreyê dihat: “Ey dayîka min ya ku ti xweşî te nedîtin, ey dayîka rojreşa min”.

Mir û sedan çîrokên nebihîstî jî digel de mirin.

Heyrîmayî mabûm. Heyrîmayî.

Bertekên piştî kuştina Eymen El Zewahirî, ji aliyê Amerîkayê ve

Bertekên piştî kuştina Eymen El Zewahirî, ji aliyê Amerîkayê ve

Kuştina Zewahirî li Kabola payîtexta Efxaniştanê, ji aliyê Amerîkayê ve, bertekên cuda bi dû xwe de anîn.

Roja 2`ê Tebaxa 2022`an, piştî belavbûna nûçeya kuştina Eymen El-Zewahirî, serokê girûpa terorîstiyê Elqaîdê, li Efxaniştanê de, Antonî Bilînken wezîrê derve yê Amerîka ragihand ku Taliban soz û peyman ji

Amerîkayê re dabû, şikand û rêkevtinnama Dohê bin-pêkiribû û rê dabû Zewahirî û Elqaîdê, ku li bin sîber û hingilê wan de bijîn. Herwisa wezîrê derve yê Amerîkayê, Taliban bi alîkariya Elqaîdê sûçdar kir.

Piştî kuştina Zewahirî ji aliyê Amerîkayê ve, zaf alî û welatan bertek nîşan dan û piraniya serkirdên welatan, spasiya Amerîka kirin ku terorîstekî metirsîdar kuştîye.

Erebîştana Seûdî û piraniya

welatên Erebi, û Turkiye ji welatên herêma Rojhilata Navîn, û piraniya welatên Ewropayî kuştina Zewahirî bi erênî zanîn.

Di devedevê yek saliya wegeryana Taliban bo ser desthilatê li Efxaniştanê de ku bi çira kesk û rizamendiya Amerîka bû, rêberê girûpa terorîstiyê Elqaîdê li Kabola Efxaniştanê de bû armanca êrîşêke esmanî ya Pehpadên Amerîka û di mala xwe de kevtê ber mûşekê û hate kuştin.



Ayhan Demir: "Urmiye bajarekî Kurdî û qedîme, xwedî dîrok û çand e. Hê ez piçûk bûm min kehla DIMDIM ê bihîstîbû."



Helbestvan: Ayhan Demir

Min vê care digel helbestvanê Kurd Ayhan Demir li derheq helbesta wî ya bi navê Gola Urmiyê û yên din wî yên neteweyî hevpeyvîne pêk anî û wî her di vê derherqê de got: "Urmiye bajarekî Kurdî û qedîme, xwedî dîrok û çand e. Hê ez piçûk bûm min kehla DIMDIM ê bihîstîbû."

P: Ezbenî ji kerema xwe ji xwandenanên rojnameya Agirî re bidin naskirin?

B: Ez Ayhan Demir, li gundê Koço ya girêdayî naveçeya Gîhadînê ya girêdayî bajarê Agirî, jidayîk bûme. Min dibistana derstpêkî heta lîseyê li Gîhadînê, dibistana bilind li bajarê Eskişehirê xwendîye.

- Ez li xurtaniya xwe heta roja îro li kêlega gelê xwe bûme.

- Salên 1999-2003'an serokê Partiya Demokrasiya Gel (HDP) li bajarê Agirîyê bûm.

- Xebatê min piranî nav siyasî de derbas bûn. Li sala 2003 de ez hatim Swîsreyê (Isviçre) û li vir jîyana xwe derbas dikim.

P: Ezbenî çi bo ku we biryar şandin helbestan vehûnin an çi tiştêkê eleqeya we bo helbestan rakêşa?

B: Xortaniya min nav siyasî de derbas bû. Min gelek herêm naskirin, sosyolojiya gelê Kurd min pir naskir. Zimanê kurdî bi min lîrik dihat, zimanekî nivîsarî bû. Bandora radyoya Rewanê li ser min hebû. Min dengbêj

guhder dikirin.

- Berê ve eleqa min çandê re hebû. Ez fikirîm min ji xwe re got "gere ez ji milletê xwe re mîratekî bihêlim" û min deşt bi vehûnandina helbestan kir. Wê demê baş diçe.

P: Rêzdar Ayhan Demir çi bû an çi hilkeftê hebû ku we biryar şand li ser Urmiyê helbestek taybet vehûnin? û ji aliyê xelkê ve çi pêşwaziyek hebûye?

B: Urmiye bajarekî Kurdî û qedîme, xwedî dîrok û çand e. Hê ez piçûk bûm min kehla DIMDIM ê bihîstîbû. Em ber ştranê Radyoya Îranê rehetiyê Birê mezin bûn, gelek tiştên balkêş hen e bajarê Urmiyê.

Berxwedana Xanê Lepzêrîn û serhildana Smaîl axayê Şîkak hêla din Dr Qasimlo..

Min ev nenivîsiya nedibû. Piştî helbesta Urmiyê bi sedan siroveyên kêfxweşiyê hatin. Bi dehan tîkiliyên min ji kurdên Rojhilat re çêbû. Bandorek mezin û dengvedanedeke mezin da Kurdên Rojhilat.

P: Tu helbestên Ayhan Demir hene ku bi dengê kesên din hatibin xwandin?

B: Gelek kes helbestên min dixwînin û gelek kes jî distêrin. Cara yekemîn xortekî Bazîdî helbestê min xwendin. Navê wî Welat Bazîdî ye, ez spasiya wî dikim. Piştî wî gelek kes helbestên min xwendin. Ji rojhilat ji Hemîd Urmiye dixwîne.

Hunermend Hekîmo, Mihemedê Serhedî, Paşayê Efo (Rusya), Ozan Zozanî (Rojava) û gelek kes distêrin.

Nêzikî sed helbestan min dane hunermendan, vêga hazir dibin.

P: Helbesta we ya werin min bikujin hikayetiya wê çi ye?

B: Helbesta "Min bikujin" helbesteke welatparêziye.

Hem di asta bilin de hezkirina welat e.

Min ji bo herçar parçeyan nivîsiye. Di wê helbestê de hûn dikarin hisreta herçar parçeyan bibînin.

P: Rêzdar Ayhan Demir, helbestên we zêdetir siyasî ne an evîndarî? Çima?

- Helbestên min piranî evîndarî e, evîna welat pêşiya hemû tiştî ye. Meriv bû evîndarê welatekî hez her tiştî wî welatî dike. Ez ji hez însanê welatê xwe, axa welatê xwe dikim. Çiqas bedewî hebe dixwazim binîm ziman. Helbestê min realîtene, ne polîtîk in, raştiyeke gelê me ye, berxwedane û dîrok e.

P: Dawîn pirs rêzdar Ayhan hûn dikarin ji xwandevanên me re bidin zanîn ku heta niha we çi pirtûkên helbestan nivîsîne an çend heb helbestên we hene?

B: Heta niha pirtûkê min çap nebûn. Pirtûkê min tunene. Lê min amadekariya sê (3) pirtûkan kiriye. Ezê demeke kin de biweşînim. Pirtûkek li ser evîni, pirtûkek bedewiya welat, yek jî qehremanî û dîrokî

Rêzdar Ayhan Demir helbestvanê giranqedir yê Kurd spas bo we û bo wan şîroveya wan pirsan ku xwandevanên rojnameya Agirî rohnî kirin.

Spas bo we û bo şîfa rojnameya Agirî ku ev derfeta afirandin ez bi karim ji rêya wê rojnameyê ve digel gelê xwe li her derî vê cîhanê bin hizrên xwe behs bikim.

Serkeftin û serbilnîdî bû xebata rizgariya gelê Kurd.

KURE MIN RE.

Welat nede sîr pîvaz,
Xebat bike wek honaz,
Ji bo welat şer bikî,
Tu yî bibî serfiraz..

Dûr bikeve ziktêr a,
Can û ruhê min te ra,
Xwe nefroşe mal,pera,
Nebe ker ê ji ker a..

Bibe zelayê dilsoz,
Biçirûse mîna roj,
Nekeve nav qirêjê,
Tucar nebe heştîkoj,
Me derbas bû hezar sal,
Ji ber derda nale nal,
Dijmin ra nebe heval,
Hilde heyfa bavê kal.

Tu guh bide jîr û zan,
Ser xatirê bavo can,
Serê dayîke qurban,
Nebe kurê bê îman..

Nede pey partî hêza,
Nebe mîna berx pêz a;
Bo warkozeke aza,
Çêke xana miraz a.

Bide can û bide mal,
Neqş bike keda helal,



Bibe ave ke zelay,
Bo Kurdiştana delal..

Ayhan Demir.

Nerîna Lîderan



“Rafael Grossi:”

Asta bernameyên navkî yên Îranê di halê berfirh bûnê dene.



“Mes'ûd Barzanî:”

Berdewamiya hizra şovnîsm li Îraqê rêgire bona danîna tev aliyên.



“Muqteda Sadr:”

Niha derfetek mezin bona guherînkariyan di sîstema siyasî ya welat de pêk hatiye.



“John Kirby:”

Amerîka bi awayekî çalak di gel Îsraîl, Feliştîn û hevpeymanên deverê di pêwendî deye ku piştî êrişên roja îne aramiyê bo deverê bi zivirîne.

25'ê Gelawêjê û hevgirtina mayînde!



N: Eskender Ceiferî

Ev 16 sal bûn ku refên Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê PDKÎ rastî veqetiyane hatibûn.

Niha em ber bi 25'ê Gelawêjê salvegera avakirina vî partiyê ve diçin û nûçeya hevgirtina HDK û PDKÎ dilên hemû Kurdiştaniyan xweş dike.

Roja 22'ê Kanûna Paşîn a sala 1946'an a Zayînî anku 2'ê Rêbendanê ya sala 1324'an a Rojî, Komara Kurdiştanê ji aliyê Qazî Mihemed ve li meydana Çarçira ya li bajarê Mehabadê ya Rojhilatê Kurdiştanê hate ragihandin û wê hikûmeta Kurdî, ala netewî ya Kurdiştanê hilda. Di vî rêûresmê de Qazî Mihemed wiha sund xwar: “Bi mezinatiya Xwedê, rûmeta Qurana Kerîm û li ser welat û ala xwe sundê dixwem heta dilopa dawî ya xwîna min û nefesa min a dawiyê, bi can û malê xwe, di rêya azadiyê de, ji bo ku alên me li esmanan pêl bidin, ezê xebatê bikim.”

Komar, ji aliyê heman partiyê ve hate avakirin ku niha jî piştî vî dîroka dirêj, hîn di xebatê de berdewam e û bûyê şanaziya Kurdan.

Beriya wê jî li vî navçeyê serhildanên Şêx Ubeydullayê Nehrî û Simkoyê Şikak çê bûbûn.

Piştî ku sala 1941'ê Şahê Farsan, Riza Şah bi derbeyeke ket û kurê wî Mihemedriza bû desthilatdarê rejîmê, wê demê serokeşîrên Kurdan ên ku ji Kurdiştanê hatibûn dîrxiştin, zivirîn Kurdiştanê û hewl didan desthilat û rêveberiya navçeyên xwe bi dest bigirin.

Êdî rojavayê Îranê ketibû bin desthilata Kurd û Azerbaycaniyanê de û Rûsî jî derbasî navçeyê bûbûn.

Sala 1942'an li Mehabadê kovara bi navê Nîştîman bi beşdarbûna 11 kesên hate weşandin û weke rojnameya fermî ya Komeleya Jiyanew-

eya Kurd (Komeley J.K) hate binavkirin û li ser hesta netewî ya Kurdan kar dikir. Navê vî komeleyê di hate wateya vejandina Kurdan. Piştî sê salan di sala 1945'an de bi pêşengiya Qazî Mihemed, Komeleyê dewsa xwe da Partiya Demokrat a Kurdiştanê û daxwazên vî partiyê, xweserî, perwerdeya bi zimanê dayîkê, fermîbûna zimanê Kurdî û gelek xwestekên din jî bûn.

Ji bilî Komara Agirî li Bakur û hikûmeta Şêx Mehmûd Berzencî ku li Silêmaniyê hatibû ragihandin, Komara Kurdiştanê jî di warê dewletbûnê de ji bo Kurdan bû ezmûneke din. Kurdan êdî ji xwe re şoreşên Agirî, Simko û yên din kiribûn mînak û waneya berxwedanê ji wan hîn bûbûn. Piştî ku di 22'ê Kanûna Paşîn a 1946'an Komara Kurdiştanê hate ragihandin, Leşkera Kurdiştanê anku Artêşa Kurdiştanê hate avakirin ku heman Hêza Pêşmerge bû. Ew hêz ji hezaran gencên Kurd û ji leşker û hêzên wan eşîran pêk dihat ku tevî Komara Kurdiştanê bûbûn û her du hêzên siwar û peya lixwe digirtin. Komara Kurdiştanê ya ku li Mehabadê bi Serkomariya Qazî Mihemed hate ragihandin, çarde wezîr jî lixwe digirtin ku ev in; Serokwezîr: Hacı Baba Şêx, Wezîrê Karûbarên Navxwe: Mihemed Emîn Mu'înî, Wezîrê Karûbarên Derve: Ebdulrehman Îlxanîzade, Wezîrê Şer û Parastinê: Seyf Qazî, Wezîrê Darayiyê: Ehmed Êlahî, Wezîrê Dadê: Mela Husên Mecdî, Wezîrê Rêûbanan: Îsmail Îlxanîzade, Wezîrê Ragihandinê: Sîdîq Heyderî, Wezîrê Post, Telefon û Telegrafê: Kerîm Ehmedeyan, Wezîrê Perwerdehî û Fêrkirinê: Menaf Kerîmî, Wezîrê Kar: Xelîl Xosrevî, Wezîrê Ticaret û Bazirganiyê: Hecî Mîstefa Dawûdî, Wezîrê Tendurîstiyê: Seyîd Mihemed Eyûbiyan, Wezîrê Çandiniyê: Mehmûd Welîzade. Wan wezîran, yasaya Komarê zelal kirin. Di dema yazde mehên temenê Komara Kurdiştanê de gelek rêxistinên aborî, leşkerî,

civakî, sîstema perwerdehiyê, çandî, wêjeyî, hunerî, şanoya Kurdî, saziyên ji bo parastina mafên jinan jî hatin pêkanîn, çapemenî hebûn û zimanê Kurdî jî bû zimanê fermî. Ev berhem û gelek berhemên din û herwisa Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê PDKÎ, ji mîratên Komara Kurdiştanê ne ku heya îro jî li dijî dagirker xebatê dike.

Aboriya Komara Kurdiştanê li ser bac û ticaretê birêve diçû bi rengekî ku komîsyonekê li navendên bajaran bac ji tacir û bazirganan distand û komîsyonekê jî di rêya axayan re baca gundewaran kom dikir. Herwisa Komara Kurdiştanê bixwe jî çalakiyê bazirganî û ticaret dikir ji bo ku dahata pêwîst ji bo xercên hikûmetê bi dest xwe ve bîne. Hêzên Rejîma Şayê Farsan, bi desteka Berîtanyayê di roja 17'ê Kanûna 1946'an de, leşkerên xwe birin aliyê Kurdiştanê. Ji bo ku xelk neyê komkujkirin, Qazî Mihemed, berdewamkirina riya xwe, sparte hevalên xwe û êdî komar hate hilweşandin û Qazî Mihemed xwe radest kir. Ji bilî desteka Berîtanya, Sovyetê jî bi Îranê re lihev kiribû ku pêwendiyên wan ên aborî bi rejîma Şahê Farsan re berdewam bikin û di lihevhatina wan de hatibû destnîşankirin ku “Mijarên Azerbaycan û Kurdiştanê, pîrsgirêkên navxwe ne û Îran divê bixwe, van pîrsgirêkan çareser bike û êdî Sovyet piştigiriyê nade van neyarên Îranê. Herwisa êdî hêzên Sovyetê û ên Berîtanya jî, ji axa Îranê bi temamî vedikişyan.”

Di roja 31'ê Adarê a sala 1947'an a Zayînî de Qazî Mihemed serokkomarê Kurdiştanê, Seyf Qazî wezîrê Şer û Parastinê yê Komarê û birayê wî Sadr Qazî li meydana Çarçira ya Mehabadê hatin darvekirin lê rêbaz û çepera wan, heya niha jî her didome û bûye şanaziya Kurdan. Bê guman bi vî hevgirtinê, hem ruhê paqij e Pêşewayê nemir û hemû şehîdên doza rizgariya Kurdiştanê şad dibe û hem dilê endam û alîgiran û hemû xelkê Kurdiştanê jî xweş be.

Tîrmeheke siyasî ya gerim û rewşa Rojavayê Kurdistanê



N:Ebdûlazîz Qasim

Helbet ku dê bandora herdu Lûtkeyên Navdewletî-Herêmî, Lûtkeya Cidayê di 16'ê Tîrmehê de, û Lûtkeya Tehranê di 18'ê Tîrmehê de, li ser navçeyê bi tevahî û di nav de li ser pîrsa Kurdî li Rojavayê Kurdistanê hebe, nemaze ku ev herdu civîn di demekê de hatin ku navçe û cîhan ber bi peydabûna cemsergêriyek navdewletî û herêmî diçe, herwiha ku cîhan û Rojhilata Navîn piştî şerê Rûsya li ser Ukrayna di rewşeke awarte û di çend kêşeyên siyasî, aborî û ewlekarî de derbas dibe, û dîr nîne ku bandora van herdu civînan di demek nêzîk de li ser tevahya navçeyê hebe, bi taybetî ku di Lûtkeya Tehranê de gelek mijarên girêdayî rewşa Rojavayê Kurdistanê hatin gotûbêj kirin, ligel gefên Tirkîyê yê berdewam li dijî gelê Kurd yê Rojavayê Kurdistanê ji bo berfîrehkirina dagîrkeriya xwe.

Hevdem ligel nêzîkbûna di navbera Tirkîyê, Îranê û rejîma Sûriyê de, ku roj bi roj gefên Tirkîyê ji bo pêkanîna êrîşêke din ji bo dagîrkirina herdu navçeyên Tilrifet û Munbicê zêde dibin, dibe ku heta niha Rûsya êrîşa Tirkîyê erê nekiriye, nemaze ku li devera rojavayê çemê Firat, tişteke nabe ji derveyî plan û projeyên Rûsyayê, PYD jî baş vê yekê dizanî, lewra li ser hebûna xwe ya Rojavayê Firatê girewê li ser helwesta Amerîka nake, belkî bêhtir girewê li ser tîkiliyên xwe yê ligel Moskow, Tehran û Şamê dike, ji ber wisa Tirkîyê ji bo pêkanîna êrîşên



xwe li ser deverên rojavayê Firat dixwaze çira kesek ji Moskow û ji Tehranê bişîne, heta ji bo vê armanca xwe ya dijminkarî misoger bike, dîr nîne ku tîkiliyên xwe ligel rejîma Sûriyê bihêz bike, wekî heman daxuyaniya wezîrê derve yê Tirkîyê dayî ku welatî wî ji bo oparsyona li dijî hêzên HSDê amadeye ku bi rêkeftin ligel rejîma Sûriyê pêk bîne.

Îro piştî Lûtkeya Tehranê xuya dibe ku rêkeftinek nû di navbera Tirkîyê, Sûriyê û Îranê de peyda bûye, û dibe ku Rêveberiya Xweser ya PYD, bikeve di tengaviyek mezin de bi taybetî hebûna wê ya li deverên Rojavayê Firatê, ku rojane êrîş bi dron û top û rokêtan li ser hêzên wê ji aliyê Tirkîyê û çeteyên wê ve tene pêkanîn, lewra jê tê xwestin xwe nêzîkî aliyên kurdî bi taybetî ENKSê bike

û tîkiliyên xwe yê ligel Hikûmeta Herêma Kurdistanê bihêz bike, nemaze wekî xuyaye ku ti encam nehatine dîtin ji gotûbêjên xwe yê dirêj ligel rejîma Sûriyê.

Ji aliyek din, ji bo şirovekirina rewşa Sûriyê bi giştî, nabe pêgeh û rola Îsraîlê jibîr bikin, ku wê rolek girîng heye, û li gore axaftina du karbidestên Îsraîlê ji Axios.com re, ku Îsraîl HSDê wek hevalbendê xwe li hember zêdebûna pêgeha Îranê li Sûriyê dibîne û ji ber vê yekê di salên borî de çî ji aliyê dîplomatik ve û çî bi rêyên din piştgiriya wê kiriye, ku Eyal Holata, Şewirmendê Asayîşa Netewî ya Îsraîlê, ji hevtayê xwe yê Amerîkî Jake Sullivan re ragihandiye ku her êrîşêke nû ya Tirkîyê li bakurê Sûriyê dê zirareke mezin bide "HSD", Îran dê di demeke dirêj de jê sûdmend

be.

Xuya ye ku Rûsya dixwaze ku rejîma Sûriyê bi her awayekê bikaribe dubare tevahiya erda Sûriyê kontrol bike, û zêdebarî ku niha tîkiliyên Rûsya ligel Îsraîlê wekî berê nînin, bi taybetî ji ber helwesta Îsraîlê piştî şerê Rûsya li ser Ukraynayê di 24ê Sibatê de, ku îro Sûriya bêhtir ji berê ketiye di nav hesabên Rûsya de, û derbarê vê yekê, ku Rûsya dê Lûtkeya Tehranê ji bo siyasî xwe li hember Amerîka û NATO bikar bîne û amadeye ku bi her nîrxekî Tirkîyê bêhtir nêzîkî xwe bike.

Tevî dibînin ku helwestên Rûsya û Amerîka piştî şerê Ukrayna li ser Rojhilata Navîn hatine guhertin, lê dîsa bawerî bi helwestên Rûsya û herwiha bi helwestên Amerîkî û Ewropî jî heta dawiyê nabe, û herdem mîletên bê deştilat di bazarên siyasî de dibin qurbanîya berjewendiyên dewletên zilhêz, hevdem ku kurd dikarin di van bazaran de bi yekîtiya xwe serbikevin, û îro pêdiviya mîletê kurd piştî lihevhatina Tehranê di navbera Sûriya, Tirkîya û Îranê de bi yekrêziyek mezin heye, û dîtir piştî herdu civînan Cidayê û Tehran, ku ne PYDê û ne jî her aliyekê kurdî dê nikaribe bi tena xwe ti deşkefeke siyasî misoger bike û berovajî ku siyasî bi tekalî dê zirarê bigehînin mîletê kurd!



Li Diyarbekirê nexweşiyek di nav ajalan de belav dibe

Diyarbekir - Li 5 gundên girêdayî navçeya Sûra Diyarbekirê di nava golikan de nexweşiyek wisa belav bûye ku ajalvanên van gundan ji nexweşiyê mexdûr in. Derbarê nexweşiya ku hîn nayê zanîn de Gerîndehiya Çandiniya Diyarbekir jî lêkolîn daye destpêkirin.

Li Diyarbekirê nexweşiyek di nava golikan de belav dibe ku hîn nayê zanîn nexweşiyek çawa ye û çavkaniya wê çi ye.

Li 5 gundên girêdayî navçeya navendî ya Diyarbekirê Sûrê yê bi navê Şemamê, Koşkê, Dara, Ax Husên û Medrebê di nava salekê de nivê golikên ku hatine dinyayê, an kor in, aştengdar in, an jî dimirin. Ajalvan dibêjin dema rewş



wisa be ew jî dikevin tengasiyê û xwedîkirina golikên ku nabînin jî ji bo wan zehmetiyan derdixe holê.

Ajalvan Halîs Kaya ji K24ê re diyar kir: “20 roj e Xwedê daye, herdû çav jî kor in. Xwedîkirina wê jî zehmet e. Heta karibin emê lê binerin. Wek bebikan em lê dinerin.”

Hacî Mîstefa ku ew jî ajalvanîyê dike, ji K24ê re got:

“Heta niha 1 miriye 1 jî kor e. Min emeliyat kir lê emeliyat nebû çareserî. Heywanên me pîranî berdavêjin. Va ye yê min bûn 3 heb.”

Li gundên ku ew nexweşiya nediyar peyda bûye bi tevahî 15 golikên ku kor in hene. Ajalvan dibêjin bûye salek ew rewş derketiye holê û didin zanîn ku wan ti caran nexweşiyek wisa di nava ajalvan de nedîtibûn.

Ajalvan Îlhan Çalışkan jî dibêje: “Çêleka min avis bû, cêwik anîn lê herdû jî mirin. Min jî çû golikek kirrî lê ew jî kor derket.”

Gerîndehiya Çandiniya Diyarbekir derbarê nexweşiyê de daxuyaniyek belav kir û hat amajekirin tîmên gerîndehiyê nimuneyên xwînê ji ajalvan sitandine û bo Enstîtuya Kontrolê ya Beytariya Elezîzê şandine û dê encam bo raya giştî were ragihandin. Bang li hemû ajalvanan hat kirin ku rewşên wisa bo gerîndehiyê bidin zanîn.

Her çiqas lêkolîn destpêkiribe û hîn encamek derneketibe jî, ajalvan dibêjin dibe ku sedema vê nexweşînê hişkesaliya sala borî be ku dermanên di nava zeviyan de hatin reşandin hîn jî di nava zeviyan de mane.

Bajarê Mehabadê ji xizmetguzariyên geştyariyê bê par e

Ev heyama salane bajarê Mehabadê ji xizmetguzariyên xweşderbasiya ciwanan bê par ma ye.

Ciwanên bajarê Mehabadê ji ber bê parbûna ji xizmetguzariyên geştyarî û şahiyên weke, Bajarê Lîştan, Sînema, şîpel siwarî ya avê, bala xwe didin bi şahiyên metirsîdar.

Bi sedema nebûna cihên seyran û xweşderbasiya ciwanan, ev neçarî bona derbasbûna demê û guhertina rewşa derûnî û vala kirina wize û kelecaniya xwe, bera xwe bibin bi kiryarên weke, afirandina aloziyên li ser şeqaman, nmayêşên metirsîdar bi motorsîkletan ku di piraniya deman de ev yek dibe sedema can ji deştan wan an jî dibe tirs û xofek bo dêv û bavê wan.

Ji bo mîna avbenda Mehabadê yek ji cihên herî balkêş e bo geştyaran, lê ti xizmetguzariyek bona xweşderbasiya demê an mifah wergirtina geştyar û ciwanên wî bajarî wîda nehatiye encam dan.



Herwisa, rûnştîyên apartamanên Seydavayê jî, bi sedema xemsarî û guhnedana bajarvaniya wî bajarî li derheq gefa herfîna kevrên derdora wir, gazincên xwe anîne ziman.

Bajarê Mehabada Kurdistanê ku cih avabûna yekem Komara Kurdistanê bûye û herwisa bajarê jidayîkbûna yekem serkomarê Kurdistanê Pêşewayê nemir e jî, ji ber deştîlata byom û berçavteng ya Cemaranê, ji tev zixmetguriyên bajarvanî û geştyarî bê par e.

Rewşa bajarên Rojhilatê Kurdistanê digel sernivîsa cemsara geştyariyê tenê li ser kaxezê ne, bi kiryar ji tev îmkanatên geştyarî, şahiya ciwanan bê par in û ciwanên bajarên Rojhilatê Kurdistanê ev heşt û kelecaniya ciwaniya wan ji wan re hertim bûye hevî.

Encamên jeopolotîk û êkolojîkî yên çikkirina gola Urmiye

N: Nîştiman Urmiye

W: Hesên Mukerem

Piştî şerê Cîhanî yê duyem, mijara ku mirov bi awayekî komî rûyê gerstêrkê diguherînin û pergala biyolojîkî dixe metirsiyê de, bûye yek xemên nigeraniyên herî girîng yên cîhanê, û herwisa weke mijarekê ye di hewzeya ewlekariya cîhanî di çarçoveya zanîsta jeopolotîk de cihê girtiye.

Her di vê derhqê de, di hejma dehkên derbasbûyî de kategoriyên mîna zêdebûna nifûsê, tedaxula rasteraşt ya mirov di sirûstê de bona dabînkirin û destpêragihîştin bi hewcehiyên binerd, jînav birina dariştanan, daketina erdê, çolistan, hişksalî, lezgîniya germbûna gerstêrka erdê ji ber pîsbûna şewatên fosîlî(hewa, av, helyana cemedî cemseran û tengbûna qata Ozonê), jînav çûna axê, koçberiya bi zorê yê ji ber guherînkariyên avhewayî û ...hwd. Li ser astên navneteweyî yên herêmî de û enternasyonalîzma gerdonî li şûna xwe de bicîh hêlêye û paşerojek nezelal û tarî li ser rêya jîngehê bi cih daniye an bi awayek din kirîza stratîjîk li ser jîngehê hakim bûye. Berdewamiya çawaniya jiyan kirinê li hundrî parametîrên destnîşankirî yên di nav avura nezelaliyê de ye.

Di dehkên derbasbûyî de mifah wergiritna nebîcî li jîngehê weke herêmên din yê welat li bakûrê rojavayê welat de jî bûye û digel derketina arîşeyên berfireh ên hawirdorê ev beşa girîng a welêt jî gijgijandiye. Lê, hişkbûn an hişkkirina gola Urmiyê li kupika wan tira-jîdiyan de cih girtiye û pêka piwerên coda yê weke aborî, civakî û jîngehî, rola girîng di bakûrê rojavayê Îranê de dilîse. Yanî digel hişkbûna gola Urmiyê çolemeyek xoyî bi panahiya 2400 kîlometran çargoşe çê dibe û guherînkariyên cuda di hew-



zeyên aborî, civakî, jîngehî û jeopolotîkî li pey xwe tîne.

Di destpêkê de û yekem encamên êkolojîk ku encama destêverdan û birêverberiya kêrnehatî ya mirov e, ku dibe sedema yekemîn guherînkariyên jeopolotîk, koçberiya bi zorê ya rûnştîyên wan hewzeyan ku dikare destpêka vê guherînkariya jeopolotîk biafirîne, di raştîyê de, selametiya rûnştîyên wan hewzeyan ku dikeve metisiyê de rê ji bo wan qonaxan vedike. Û zêdehiya nifûsê ku sedemek girîngê di lihevkerin û başiya pêgeha jeopolotîk ya wê hewzeyê de tê hejmartin û hêdî hêdî tûşî tevliheviyê dibe, an bi gotinek din kirîza tal ya jînav çûna gola Urmiye bibe hilgirê rêya kirîzên Hêdropolîtîk yê berfireh. Di raştîyê de destpêka guherînkariyên jeopolotîkiya demî ji nû ve destpê dike ku bi hinceta ava-

kirina bendavên nezaniştî û nerêde û bin av bûna guden li ser rêya avbendan, ev hewzeya ji rûnştîyan vala dibe an bi gotinek din encama wan destêverdanên nerêde koçberkirina nifûsê, çikandina golê ye, lêbelê kirîza êkolojîkiye ku îrorojê heye û hebûye.

Lê, girîngtirîn mijara ku di hewzeya jeopolotîkî ya di encama hişkbûna gola Urmiyê de çê bûye ,kategoriyên weke aloziyên eşîreyî û nasyonalîzm kirina rêya daxwazkariyê, parvebûna nifûsê û nebûna rizamendiya wan di rûnştina cihên nû de, kêmbûna hatina geştysaran bi hinceta jîdest çûna xezîneya bi navê gola Urmiyê, ji nav çûna hesta ewlehiyê ji vê dema ku jîngeh û li pey vê tendrûstiya rûnştîyên ku rasteraşt dikevin metrisiyan de, gefeke bo bajarên sînûrî yê welat yê hev sînûr digel

avhewayê hevpar de. Herçend ku tevahiya wan aloziyan raştî şerê rasteraşt nabin, lê dibin sedema çêbûna aloziyên berfireh.

Lewma pêgeha girîng a neteweyî û herêma bajarî le-rzok dibe û girîngiya berê ya sêgoşeya nifûs, êkolojî û jeopolotîk têkliyên nêzik hene, lewma bandora wêrankirina êkolojîkî bi qasî mezine ku cih û pêgeha jeopolotîkê ber bi kêmbûnê ve dibe, an bi gotinek din sêgoşeya nifûsê êkolojî û jeopolotîk têkliyek nêzik hene û wêrankirina êkolojîkî ya nifûsê ber bi aliyê hejarî, derdor rûniştinê û koçberbûnê han dide û nifûs li ser lawaziya pêgeha jeopolotîkî ya bajêr di warê geştîyarî, herêmî, neteweyî û ... hwd de, ku pirr girîngê û desthilatdariya wê bona lîstina rolên cuda dixe metirsiyê de.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Serbazekî Kurd li ser sînorê Banê dawî bi jiyana xwe anî

Roja Çarşemî 12`ê Gelawêjê, serbazekî Kurd ê bi navê “Aryan Şahmihemedî” xelkê bajarê Dîwandereyê bi sedemek nexuya li ser sînorê bajarê Baneyê dawî bi jiyana xwe anî.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, “Aryan Şahmihemedî” li yek ji binkeyên leşekrî yên li ser sînorê bajarê Baneyê serbaz bûye û bi çeka xwe dawî bi jiyana xwe anî ye.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê, hêza leşekrî ya li ser sînor ya bajarê Baneyê li dereheq xwekujiya wî serbazê Kurd ti zanyariyek belav nekirine.

Jineka Kurd li bajarê Mehabadê dawî bi jiyana xwe anî

Roja Înê 14`ê Gelawêjê, welatiyeke jin a bi navê “Şeyda Nesîrî” keça Mihemed û xelkê gundê “Befrevan” a girêdayî bajarê Mehabadê dawî bi jiyana xwe anî

Ew welatiye Kurd bi sedema pirsgirêkên malbatî û ji rêya xwarina heban ve dawî bi jiyana xwe anî ye.

Welatiyekî Kurd piştî gazîkirin bo Îtîlaata bajarê Şinoyê hat binçavkirin

Roja Pêncşemî 13ê Gelawêjê, welatiyekî Kurd yê bi navê “Kazim Tabnak” kurê “Mihemedemîn” xelkê gundê “Sîngan” yê girêdayî bajarê “Şino”yê, piştî gazîkirina bo îdareya Îtîlaata wî bajarî hat binçavkirin.

Pêka çavkaniyek agehdar, hêzên ewlehî bi bê hebûna belgeyên yasayî êrîşkirine li ser mala wî welatiyê Kurd û piştî vekolîna mala wî nekarîne navbirî binçavbikin.

Çavkaniya agehdar behsa vê yekê kiriye ku hêzên ewlehî piştî ji rêya telefonê “Kazim Tabnak” gazîkirine û binçavkirine. Heta niha ji sedema binçavkirin û tohmetên ku li dijî navbirî hatin sepanandin ti zanyariyek ji ber deşt nîne.

Her di vê derheqê de, roja Çarşemî 12ê Gelawêjê, ciwanekî din yê Kurd yê bi navê “Hêdî Şadîxa” xelkê gundê “Sîngan” yê girêdayî bajarê “Şino”yê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin.

Biriyara binçavkirina “Mikaîl Mênberî” hat demdirêjkirin

Biriyara binçavkirina demkî ya welatiyekî Kurd yê bi navê “Mikaîl Mênberî” xelkê gundê “Niyer” û rûniştîyê bajarê “Sinê”yê, ji aliyê taya du a dadgeha Şoreş ya bajarê “Sinê”yê hat demdirêjkirin.

Ew welatiyê Kurd di heyama binçavkirina xwe de, ji mafê hebûna parêzer û hevdîtin digel malbata xwe hatibû bêparkirin.

Roja Çarşemî 8ê Pûşperê, “Mikaîl Mênberî” bi bê hebûna belgeyên yasayî, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û di yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê “Sine” de di bin lêpêçînê de bû.

Ji sedem û tohmetên ku li dijî wî welatiyê Kurd hatine sepanandin, ti zanyariyek serraşt ji ber deşt nîne.

Roja Sêşemî 25ê Cozerdana 1400`an, ew welatiyê Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û roja Şemî 10ê Rezbera heman sale, bi danîna barimteya 600 milyon Tumenî heta dema dadgehê kirinê ji girtîgeha bajarê “Sine” hatibû azadkirin.

Behmen Mehmûdîazer bi danîna barimteya 500 milyon Tumenî, ji girtîgeha bajarê Şinoyê hat azadkirin

Roja Pêncşemî 13ê Gelawêjê “Behmen Mehmûdîazer” xelkê bajarê “Şino”yê, bi danîna barimteya 500 milyon Tumenî ji girtîgeha bajarê “Şino”yê hat azadkirin.

Ew welatiyê Kurd heta dema dadgehê kirinê bi danîna barimteyê hatiye azadkirin.

Roja Sêşemî 11ê Gelawêjê, ew welatiyê Kurd piştî bidawî hatina heyama lêpêçînê di yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê “Urmiyê” bo girtîgeha bajarê “Şino”yê hatibû veguhaştin.

Ew welatiyê Kurd di heyama binçavkirinê de, ji mafê hebûna parêzer û hevdîtin digel malbata xwe hatibû bêparkirin.

Roja Duşemî 6ê Pûşperê, “Behmen Mehmûdîazer” bi bê hebûna belgeyên yasayî, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û bo girtîgeha ewlehî ya bajarê “Urmiyê” hatibû veguhaştin.

Hêzên ewlehî ew welatiyê Kurd bi tohmeta “hevkarî digel yek ji partiyên Kurdî” tawanbar kirine

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (427)

Wêneyên civîna hevpar ya herdu aliyên Partiya Demokrat

